Neteyîse



Ehmed Şêran

Dê neteyîs
Her wekî ava li ser rêka dibîte hizir û derew
Ma kengî bû….?
Ew ronahiya li ser cada û rêkan tîrêj vedan…!
Her wekî kanîka ava zelal
Li nîv rêkê derkevît…!
Bibe rastî û aşkera bibe

Ma ew kî bû digot Mem û Zîn derewan dikin…?
Ew çi destan bû Xec û Siyamend lê hatine veşartin.
Her wek dîdevanek ji giyaneweran bû gotinek bêbawerî
Belê raste ne wesaye

Ew îlhameka pêxemberî bû
agehdar bû di nav xelkê de
Bû bawerî ji dilkî rast

Her wekî Firawin û Haman di avê de xendiqîn
Piştî hingê berçav bûn da bibîte rastî…!
Dê neteyîs
Û bibe rastî

Ew dîkela serê wê, li esmana li bin wê, rastiye
Agir û sotandin ne derewa bêbawerî
Da bibîte rastî…
Ew gelavêja payîzê ya bi xeme
Çunkî dizanît payîz dê belga werînit da bibîta rastî..
Barkirina balinda û teyran ji warê xweştiviyan.
Dê neteyîs û bibe rastî

Her wekî derya hilmê dide li esmana dibîte ewir da bibîte rastî û bibarê baran,
da bibîte befir û gijlok,
li ser çiya û deşta eve raste, ne derewe
dê neteyîs û bibe rastî.